# Efrîn di bin dagîrkeriyê de (242):

## Girtinin, basmîşkirinin ji malên sivîlan re; Kuştin, lihevxistin, pevçûn û dijberîkirina ser sivîlina; Bendkirin, işkencekirin, vêrgiyine diravî, baceyin û dizînin













Rûdana geregoşî û serberdayetiya giştî ya ku herêm dibîne -ji dema dagîrkirina wê ji aliyê Turkiyê ve li /2018/an aşkere û riswa û şermezar bûye, û navnîşana wê ya herî berz desthilatdariya milîseyî ya di navêna bidehan giropên çekdar ên nandoz ên gendeliyê li ser erdê dikin de ye; Di pêvajoya kiryar û siyasetên dijayetiyê yên rêbazkirî li dijî Kurdan û herêmên wan ji aliyê Hikometa Dad û Geşepêdanê ve bi serokatiya Erdoxan; Ev jî heyînin belgekirî li ser rewşa serwerkirî ne:

**= Girtinine bêsûcane:**

**-** Ji du heftan ve, giropeke gerok e hevbeş ji "Istîxbaratên Turkiyê" û Milîseyên "Asayêşa Leşkerî li Reco" Hemwelatî "**Mehmûd Reşîd Reşîd** /53/sal/ Malbata Elîko" ji xelkê Gundê "Qurnê" - Navça Bilbilê girt, piştî vegera wî ji ciyê penaberiyê bo warê xwe bi du heftan, bi tuhmeteke çêkirî, û herweha jî kurê birayê wî "**Hisên Dawod Hisik** /37/sal" bi behaneya alîkariya wî bi merivê wî re di serastkirina rewşa wî de; Û piştî ku Milîseyên "Firqit El'hemze" "Mehmûd" wesand biryargeha xwe; Û ta niha herdu bêsûcane bendkirî ne.

**= Geregoşî û serberdayetî:**

**-** Li vê dawiyê, Milîseyên "Tevgera Ehrar El'şam a Islamî" li orta Herêma Pêşesaziyê li Bajarê Efrînê ji xwe re nivîsgehek di bin navê "Nivîsgeha Rêvebirina Pêşesaziyê" de vekir, piştî ku "El'cebhe El'şamiyê" ji çend heyvan ve ji aliyê "Desteya Tehrîr El'şam" ve jê hate qewtandin; Di çarçewa parvekirina taxên bajêr û herêmê bi tevahî de -weke perçeperçe- di navêna milîseyên têvel de, ji bo wan herêman li gor ew dixwazin bi rêve bibin û gendeliyê têde bikin.

**-** Li 9.4.2023an. Z bi şev, çekdarina mala Hemwelatî "**Mihemed Isma'îl Nebo**" li Gundê "Memala" - Navça Reco (ya ku Milîseyên "Tipa Nehan/El'firqe El'tasî'e" wî desteser dikin) basmîş kir; Lê "Nebo" û endamên malbata wî kanîn yek ji wan desteser bikirana û çeka wî ji dest bigirtana û qurşîn bi jor ve bavêtana, û paşê endamên çete yên mane bireviyana; Û paşê jî Asayêşa Reco ji bo "Lêkolînê" û girtina çekdarê bendkirî beşdar bûn.

**-** Li şeva Duşemê 10.4.2023an. Z- berî "Fitara", li orta Bajaroka Reco di navbera Milîseyên "Asayêşa Leşkerî" û giropeke çekdar e "Humsî" û bi ser "Tîpa Nehan/El'firqe El'tasî'e" de pevçûnek derket û qurşîn hatin avêtin, û piştî Fitara "Heyder Be'ac - serkêşekî Milîseyên Tîpa Nehan/El'firqe El'tasî'e" bi hevaltiya çekdarekî din qurşîn avêtin du biran ji anîndeyan, li dema ku wan di şuştgeheke makînan de (ye nêzîk çateriya Gundê "Mûskê", li Derbasgeha Reco û ji rêbendeke Milîseyên "Ehrar El'şerqiyê" ve nêzîk ) kar dikirin, û di encamê de "**Elî El'fa'ûrî**" hat kuştin û birayê wî "Ûdey" jî bi kûranî birîndar bû.

**-** Li 10.4.2023an. Z, li orta Gundê "Coqê" - Bajarê Efrînê, di navbera du giropên çekdar ji Milîseyên "Furqit El'hemze" de (ya yekê ji Bajaroka Encara ye/Gundewarê Heleb ê Rojava, û ya diwem jî serkêşiya wê "Elî Hemato" dike) bi çekên sivik pevçûnin derketin, û di encamê de lingên du kesan "Temenmezin **Arêf Hesen/Bavê Fewzî** /85/sal ji xelkê Gundê Coqê, û Ebû Stêf - karmendê dermanxanê û ji anîndeyan" birîn bûn û sivîl hatin tirsandin, û paşê ji bo jihevekirinê "Asayêşa Leşkerî" destêwerdan kir, û herdu birîndar ji bo dermankirinê hatin guhestin.

**-** Li 12.4.2023an. Z, "**Elî Hemdo Berborî**" ji Bajaroka Tilrif'etê û serkêşekî Milîseyên "Firqa/50/î - Ehrar El'tewhîd - Artêşa Niştîmanî ya Sûrî" li dor Gundê "Qitmê" - Navça Şera û di nav ihracê de bi qurşînê hate kuştin, bê ku em zanibin kîjan aliya li piş piroseyê ye.

**-** Li ber "Fitara" dîrok 16.4.2023an. Z, di navêna giropeke gerok ji Milîseyên "Asayêşa Leşkerî li Efrînê" û çekdarin ji Êla El'mewalî (yên ku di gundê "Tilifê de - Efrîn" ê ku Milîseyên "Firqit El'hemze" wî desteser dikin pevçûnek derket û qurşîn hatin avêtin, li dema hewildana giropa gerok ji girtina yekî daxwazkirî re ji endamên êlê, û paşê jî girop revî.

**-** Li 17.4.2023an. Z, temenmezinê nexweş "**Yihye Şukrî Hemo**" ji xelkê Gundê "Îska" - Şêrewa (yê ku tevî hevjîna xwe bi tenê rûniştî bû, û li ser doşekê dirêjkirî bû (; Piştî ku mala wan li şeva 25.3.2023an. Z ji aliyê çekdarine diz ve hate basmîşkirin û herdu tûşî lêxistin û dizînê hatin û tenduristiya herdiwan paşve çû.

**-** Li berî Fitara dîrok 18.4.2023an. Z, çekdar "**Beşar Bekîre**" ji endamên "Tevgera Ehrar El'şam" û ji Bajarê Heresta/Gundewarê Şamê, li orta Bajarê Cindirêsê, ji aliyê çekdarekî din ve bi qurşînê hate kuştin, bê ku em kanibin sedeman nas bikin.

**-** Li 20.4.2023an. Z, li orta Bajarê Efrînê - "Kolana Siyasiyê" di navbera giropeke çekdar ji Milîseyên "Firqit El'hemze" û anîndeyine din de pevçûnin derketin holê û qurşîn hatin avêtin, û di encamê de hin birîndar ketin, û ji bo jihevekirinê Milîseyên "Asyêşa Leşkerî" destêwerdan kir.

**-** Li şeva Înê 21.4.2023an. Z, giropeke çekdar e ku "Sêf El'casêm" (biryayê "Mihemed El'casêm/Ebû Emşe - serkêşê Milîseyên Firqit El'sultan Silêman Şah") serkêşiya wê dike, li orta meydana kaniyê mekin li xoceyê mizgefta Bajaroka şiyê ya kevin xist, ji ber ku wî di gotar û nimêja siba Cejna Rojiyê de pûtûpêdan/guhdan bi "Sêf" nekiriyê û herweha ew pîroz jî nekiriye, bi ser ku xoce ji aliyê Destlatên Dagîrkeriyê ve hatiye binavkirin.

**= Binpêkirinine din:**

**-** "**Ebû Nesir**" berpirsiyarê rêbenda çekdar a Milîseyên "Firqit El'sultan Mûrad" li ser riya giştî ya di navêna herdu gundên "Kerê, Eşûnê" - Bilbilê de di ferzkirina vêrgiya mehane /75/pereyên Turk de li ser her malbateke Kurd (dora/70/ê) li Gundê "Kerê" - ji bilî /29/malbatên Ereb ên di gund de hatine niştecîkirin - berdewam e, û weha jî ferzkirina vêrgiya /50/ Dolarî li ser her donimek erd li Benda Eşûnê (dora/8/hiktaran) beramberî çandina wê. Herweha "**Ferhan**/abortiya Firqê" vêrgiyan li ser rezên tirî li gund ferz dike, jê /400/ Dolar li ser Hemwelatî "Mihemed Mihemed Mixtar" bi ser ku zeviyê wî li derveyî goristana gund û erdên bendê dikeve.

**-** Ji du heftan ve, çekdarina matorek duloqî ji pêş mala Hemwelatî "**Ibrahîm Reşo**" li Gundê "Omo - Navça Mabeta" (yê di bin desteseriya Milîseyên "Firqit El'sultan Mûrad" de) dizîn.

**-** "**Mihemed Welîd Hebûb**/Ebû Welîd ji Bajaroka Barîşa/Idlibê" û yek ji serkêşên Milîseyên "Feyleq El'mecid" û berpirsiyarê gundên "Zerka û Çobana" - Navça Reco, /8/ ciwan ji xelkên herdu gundan bi behaneya ku wan bombeyek bi makîna wî ve zeliqandine bêtirî heyvekê bend kirin, ew işkence kirin, û li ser her yekî vêrgiyeke diravî mezin /500-1500/Dolar Emrîkî ferz kir, li beramberî serbestberdana wan; Herweha jî xelkê herdu gundan agahdar kirin ku divê nên ji nûnerê wan bikirin an jî dê werin cezakirin.

**-** Ji deh rojan ve, Milîseyên "El'cebhe El'şamiyê" Hemwelatî "**Cemal Pe'ipûnê** /50/sal û hevjîna wî" ji xelkê Gundê "Erebwêranê" - Navça Şera rojekê bend kirin, piştî vegera wan ji Bajarê Heleb - ciyê penberiyê bo warên wan, û hemî heyînên mala wan a ku ji nû ve hatiye amedekirin û rêxistin dizîn.

LI siba cejnê 21.4.2023an. Z, seredanvanên goristana Gundê "Coqê" - Efrîn ên ji xelkê gund, bi ser vêşekê vebûn ku bilat û kêlikên mermerî ji gorên miriyên wan ji aliyê çekdarên diz ve hatine dizîn; Divê bê zanîn ku Milîseyên "Firqit El'hemze" gund desteser dikin.

Hikometa Turkiyê -ji ber ku dewleteke dagîrker e û xwediyê desteseriya rasteqîn e- û "Hemahengiya Niştîmanî ya Hêzên Şoreş û Rikberiyê" -ji ber ku di ber "Hikometa Demkî û Artêşa Niştîmanî ya Sûrî" de sîwana siyasî û berpirsiyar e-, vêca ew berpirsiyartiya tevahiya binpêkirin û tewanên ku di dermafê Herêma Efrînê û xelkê wê de têne kirin û ta niha jî berdewam in hildigrin.

23.04.2023 an

**Nivîsgeha ragihandinê- Efrîn**

**Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê**

--------------------------

**Wêne:**

**-** Nivîsgeha "Rêvebeberina Herêma Pêşesaziyê" ya Milîseyên "Tevgera Ehrar El'şam a Islamî".
**-** "Heyder Be'ac" - serkêşekî Milîseyên "Tîpa Nehan - El'firqe El'tasî'e" li Navça Reco.
**-** Deşta "Benda Eşûnê" li Navça Bilbilê.
**-** "Ebû Nesir" - berpirsiyarê rêbenda çekdar a Milîseyên "Firqit El'sultan Mûrad" li ser riya giştî di navêna gundên "Kerê, Eşûnê" de - N. Bilbilê.